

Editorial

Ji Nûbihar Akademîyê merheba!

Kovara Kurdolojîyê Nûbihar Akademî di sala xwe ya heftan a kovargerîya akademîk de bi hejmara xwe ya 13an li pêşberî raya giştî ya akademîk e. Di vê hejmarê de şes gotar, dokumentek û wergerek cih digirin ku ji alîyê naverokê ve temaya wan a hevbeş ziman û edebiyata Kurdî ye. Hêjayî gotinê ye ku wergera vê hejmarê û gotarek bi Kirmançî (Zazakî), yên mayî jî bi Kurmancî hatine nivîsin.

Mehmet Emin Purçak, di gotara xwe ya bi navê “Di Romanên Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê, Ez ê Yekî Bikujim û Lehiyê de Tezahurên Biyanîbûnê” de ji alîyên mekan, politika û psikolojîyê ve li ser temaya biyanîbûnê disekine. Purçak “biyanîbûn” ê wek encameke nerêni ya pirsgirêkên civakî û ferdî li qelem dide ku ev “bîyanîbûn” xwe di kesayetîya lehengên her sê romanên navborî de nîşan dide û ew li ser vê babetê nîqaşan dike. Nivîskar di encamê de tesbît dike ku pirsgirêka biyanîbûna lehengan ji welat û dûrkîfîna wan ji hest û ramanên welatparêzîyê wek temayêن hevbeş yên her sê romanîn derdikevin pêş.

Leyla Kaplan, di gotara xwe ya bi navê “Li Gorî Çar Epîzotan Berawirdkirina Çar Varyantên Destana Zembîlfiroş” de çar varyantên destana Zembîlfiroşê ku ji alîyê Xalid Sadînî, Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, A. Gernas û Heciyê Cindî & Emînê Evdal ve hatine weşandin li gorî çar epîzotan (mekan, statuya civakî ya lehengan, hevdîtina ewil a lehengan, gihiştina lehengan û mirina wan) dide ber hev. Kaplan di vekolîna xwe de hevparî û cudahîyên epîzotan radixe ber çavan.

M. Zana KARAK & Seher BİŞAROĞLU, di gotara bi navê “Di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de Şêweyên Mulemme’ê” de piştî ku derbarê pênase û dîroka mulemme’ê (helbestên pirzimanî) de agahîyan didin û ji edebîyatêن cîranan (Erebî, Farisî û Tirkî) nimûneyan pêşkêş dîkin bi awayekî berfireh analîza avahîya mulemme’ên edebîyata Kurdî dîkin û di babetâ şêweyên mulemme’ên Kurdî de senifandineke orjînal dîkin.

Nevzat Eminoglu, di gotara xwe ya bi navê “Nêrînek Gelempêri li Edebîyata Kurdî ya Serdema Mîrektiya Hekariyê” de girêdayî geşadana wêjeya Kurdî ya serdama mîrektiyêن Kurdan, bal dikîşîne ser rewşa edebîyata Kurdî ya serdema Mîrektiya Hekariyê. Di xebata Eminoglu de diyar dibe ku Mîrektiya Hekkariyê di nimûneya helbestvanêن wek Pertew Beg û Melayê Bateyî de navendeke girîng a edebîyata wê serdemê ye. Eminoglu di gotarê de bi taybetî ifade dike ku bingeha

edebiyata nivîskî ya Kurdî ya li Hekariyê bi medreseyên Hekariyê dest pê dike û pêş dikeve.

Veysel Yıldızhan di gotara xwe ya bi zaravayê Kirmancî ya bi navê "Leksîkografi, Metaleksîkografi û Bîbliyografîyaya Ferhengê Kirmancî (Zazakî)" de li ser bingeha agahiyêner derbarê ferhengsazî û ferhengnasiyê xebateke bibliyografîk ya Kirmancî amade kirîye. Di xebatê de ferhengên bi zaravayê Kurmançî jî hatine nasandin. Yıldızhan di dawîya gotarê de bîbliyografîyaya ferhengên Kirmancî (Zazakî) yên heta 2020an hatine çapkirin jî îlave kiriye ku li gor vê bîbliyografîyayê jimara ferhengên Kirmancî gihîştîne 30 hebî.

Ayhan Yıldız, di gotara bi nave "Tevgera Wergera Kurmancî li Sûrî û Tirkîyeyê" de, rewşa wergera Kurmancî ya li Tirkîye û Sûrîyeyê bi navêner wergêr û berheman ve dîyar dike. Yıldız xebata xwe bêhtir li ser şopa wergerên Kurmancî yên nivîskî ku berî salên 2000î hatine kirin û li Tirkîyeyê hatine çapkirin bi sînor kiriye.

Wergera vê hejmara Nûbihar Akademîyê ferhengokeke bi Kirmancî ye ku ji aliye oryantalist, etnolog û filologê Ingilîz Robert Gordon Latham (1812 - 1888) ve hatîye nivîsin û ji berhema wî ya bi navê *Essays Chiefly Philological and Ethnographical-1860* (rupelên 242-244an) hatîye wergirtin. Xebat ji aliye Nureddin Beltekîn ve digel têbînîyen pêdivî ji Ingilîzî bo Kirmancî hatîye wergerandin.

Dokumenta vê hêjmarê jî nameyek e ku di dema herba Urîs û Osmanîyan de ji Axayekî Kurd ê Ezidî bo serbazêkî Rus hatîye nivîsin. Name ji aliye Mîrze Axa ve, di 22yê gulana sala 1830î de, bo İvan Feodrovîc Paskevîç hatîye şandin ku di pileyeke bilind a Monarşîyê (Graf) de ye. Name çiqas kurt be jî, di wê serdemê de û di şertên herbê de di biwara têkiliyên Kurdên Ezidî û Urîsan, bi taybetî jî di biwara tifaqa wan a li dijî Osmanîyan de têbînîyen balkeş pêşkeş dike.

Heta hejmara bê ya *Nûbihar Akademîyê* em dîsa bi xebatêner nû yên zanistî werin pêşberî we bimînin di nav xweşîyê de.

Edîtorêñ Jimarê

Editor

Nûbihar Akademi presents its 13th issue in its seventh-year of academic journalism. This issue includes six articles, a document, and a translation under a common theme of Kurdish language and literature. It is worth mentioning that the translation piece in this issue and one of the articles were written in Kirmanci (Zazaki), and the rest were in Kurmanji.

Mehmet Emin Purçak, in his article titled “The Manifestations of alienation in the novels, *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê*, *Ez ê yekî bikujim*, and *Lehî*,” focuses on the theme of alienation with respect to space, politics, and psychology. Purçak describes “alienation” as a negative consequence of the social and individual problems that manifestation itself in the characteristic representation of the heroes in all three novels. He concludes that the alienation of the heroes from their land as well as separation from patriotic feelings and ideas emerge as a common theme in all three novels.

In her article titled “Comparison of the Four Variants of the Zembilfiroş Epic based on the Four Episodes,” **Leyla Kaplan** compares four episodes (places, social status of heroes, the first encounter of heroes, the arrival of heroes, and their death) with the published four variants of the Zembilfiroş epic by Khalid Sadini, Ordîxan Celil & Celil Celil, A. Gernas, and Haji Cindi & Emin Evdal. Kaplan highlights the similarities and differences between the episodes in her study.

M. Zana Karak & Seher Bişaroğlu, in their article titled “Mulamma Styles in Classical Kurdish Literature,” provide a comprehensive analysis of Kurdish literary mulammases’ structure. They present an original classification of Kurdish mulammases’ styles after providing the background for the definition and history of mulamma (multilingual poems). The article also includes examples of mulamma from neighboring literature (Arabic, Persian and Turkish).

Nevzat Eminoglu’s article titled “A General Perspective on Kurdish Literature during the Hakkari Dynasty” aims to shed light on the development of Kurdish literature during the Kurdish monarchy. The article highlights the situation of Kurdish literature of the Hakkari Dynasty, which was an epicenter of the literature of that period in the example of poets such as Pertew Beg, Ahmad-i Xanî and Melaye Bateyi. Eminoglu asserts that the Kurdish written literature in Hakkari begins and develops with the Hakkari madrasas.

Ayhan Yıldız, in his article titled “The Kurdish Translation Movement in Syria and Turkey,” describes the situation of Kurdish translation in Turkey and Syria by the names of translators and the literary works. The article covers the written Kurdish translations before the 2000s and published in Turkey.

Veysel Yıldızhan has prepared a bibliographic work on Kirmancî based on lexicography and metalexicography in his article titled “Lexicography, Metalexicography, and Bibliography of the Kirmancî (Zazaki) Dictionary.” Dictionaries with Kurmanji dialect were also introduced in the study. At the end of the article, Yıldızhan attached a bibliography of thirty Kirmancî (Zazaki) dictionaries published up to 2020.

The translation piece in this issue of *Nûbihar Academy* is an article on Kirmancî (Zazakî) vocabulary written by the English ethnologist, Robert Gordon Latham (1812 - 1888) published in his book titled *Essays Chiefly Philological and Ethnographical-1860* (pp. 242-244). The work translated to Kirmancî (Zazakî) by Nureddin Beltekin, titled “Çend Çekuyanê Zazakî Ser o,” with a commentary.

The document provided in this issue is a letter written from a Kurdish Yezidi lord (Axa) to a Russian soldier during the Russian and Ottoman wars. The letter was sent by Mirzê Axa on May 22, 1830 to Ivan Feodorovich Paskevich, a high official of the Monarchy (Graf). However, the letter provides exciting insights into the relationship between the Yezidi Kurds and the Russian, particularly about their alliance against the Ottomans, during that period and in the context of the war.

We are looking forward to bringing you new and exciting scientific work in the next issue of Nûbihar Academy.

Editors of the Issue